

## Vaksînên Koronavîrûs ji bo jinên ducanî

Agahiyên kurt liser vaksînên Kovîd-19 ji Enstîtuya Tenduristiya Giştî ya Norwêcê.

---

Jinên ducanî bi gengaziyek zêde tûşî bandorên neyîniyê giran ên nexweşiya Kovîd-19 dibin. Çiqas maweya ducaniyê zêde be, nexweşî girantir dibe. Enstîtuya Tenduristiya Giştî ya Norwêcê li jinên ducanî pêşniyar dike ku bi vaksînêdana du dozên vaksînên koronavîrûs xwe biparêzin.

### Pêşniyar:

- Hemî jinên ducanî yên ku hêj doza yekem a vaksînê kamil nekirine, divê bêyî berçavgirtina vê yekê ku ew ji kîjan sêmehê ducanî de ne, vê bikin.
- Hevdem ji jinên ducanî jî tê pêşniyar kirin ku dozek bihêzker (boster) bistînin. Standina vaksînê bi taybet di sêmeha duyemîn an sêyemîn de, herî kêmtir 20 hefte piştî dermankirina yekem, û di sêmeha yekem de ji bo jinên bi nexweşiyên din ên taybetî re girîng e.

### Pêşîne

Norwêcê lêdayina vaksîna koronavîrûsê ji jinên ducanî re piştî bidestxistina agahdariya zêde li ser bandora lêdayina vaksînê li ser tenduristiya dayik û zarokan pêşniyar kirirye. Agahiyên ku em di derbarê bandora vaksînê de hene, bi giranî ji welatên din in. Wek mînak Brîtanya ev demeke dirêj e ku bi vê nexweşiyê re rû bi rû maye û gelek jinên ducanî yên ev welatî rakirin nexweşxaneyê.

Lêkolîna navneteweyî destnîşan dike ku jinên ducanî yên tûşî Kovîd-19 li hember jinên ne ducanî yên di heman temenî de pirtir di nexweşxaneyê de dirazandin û hewcedariya wan bi alîkariya nefesê dibû. Rêjeya kesên ku hewcedariya wan bi alîkariya nefesê heye bi belavbûna her cûre vîrûsa korona zêde bûye. Herwusa, gengaziya zayina pêşwext di jinên ducanî yên tûşî Kovîd-19 li hember jinên ducanî yên ku di heman qonaxa ducaniyê de tûşî Kovîd-19 nebûne zêdetir e. Di nav jinên ducanî yên ku bi tevahî hatine vaksîne kirin, kêşeyên zayin û zayina pêşwext kêmtir bûne.

Ev lêkolînan bandora parastinê yê vaksînê li hember bandorên neyîniyê giran ên nexweşiyê di laşê dayikê de destnîşan dikin û girîngiya bidestxistina parastinê bi vaksînêdanê (eger gengaz be) nîşan didin. Antîbodiyan ku piştî vaksînêdanê di laşê dayikê de çê dibin jî derbasî pitikê nav zikê dibin û pitik jî piştî zayinê diparêze. Bandorên neyîniyê yên vaksînê li ser ducaniyê an tenduristiya pitikê nehatiye destnîşan kirin.

### Bandorên neyîniyê

Bandorên neyîniyê yê herî zêde wekî serêş, westandin, nexweşî, tay, gêjbûn û êşa laşî jî di jinên ducanî de derdikevin. Ev nîşanan bi giştî yek an du roj piştî vaksînêdanê derdikevin û bi qasî 2-3 rojan berdewam dibin. Li Norwêcê ti bandorên neyîniyê têkildarî ducaniyê bi sedema karanîna vaksînên erêbûyî nehatine ragihandin.

### Ez li kû dikarim vaksîna koronavîrûs bistînim?

Ji bo agahdariyê zêdetir li ser navendên vaksînên koronavîrûs, bi nexweşvan an bijîjka/ê xwe re têkilî daynin an serdana malpera şaredariya xwe ya herêmî bikin.

Tittel: Koronavaksine til gravide

Språk: Kurmanji

Opprettet: 01.12.21

**agahdariyê zêdetir**

Oppdatert: 16.02.22



Di rêbernameya koronavîrûsê de li ser pêşniyarên taybetî ji bo jinên ducanî û şîrdanê de bêtir bixwînin:

<https://www.fhi.no/nettpub/coronavirus/befolkningen/rad-for-gravide-og-ammende/>